Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1249 19-Sibat-2025 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

Sinehetkarê qurmikên daran

Navenda Nûçeyan

Hostayê daran Fûrkan Demîrtaş ku ev 18 sal in bi keda destê xwe teşe dide daran, da zanîn ku ji ber ew gelekî girêdayî welatê xwe ye naxwaze biçe tu deran û got: "Ez dixwazim gelê me jî xwedî li me û karê me derbikeve."

Hunera destan şaxek hunerê ye ku hobî û çalakiyên mirov bi destên xwe çêdike, di nava xwe de dihewîne. Dibe ku ev berhem ji bo mebestên keyfî an jî bazirganî be. Hin hunerên destan li ser rêûresmên ku bi sedsalan weke hunera gelêrî derbasdar in têne çêkirin. Li Kurdistanê jî hunera destan gelekî belav e û li hemû herêmên Kurdistanê mirov rastî hunera destan tê. Li herêma Bedlîsê jî hunera destan di nava gel de cihekî taybet digire û dewlemendiya herêmê nîşan dide.

Yek ji wan huneran hostatiya daran e ku xwezaya Kurdan nîşan dide. Hostayê daran Fûrkan Demîrtaş (32) ku li navçeya Tetwan a Bedlîsê atolyeyek vekiriye, ev 18 sal in hostatiya daran dike. Demîrtaş, berhemên weke tasên ji bo şekirê, guldank, berhemên ji bo xemilandina derdor hwd. Çêdike û di atolyeya xwe de difiroşe. Hostatiya daran hêj di zaroktiyê de bala Demîrtaş dikişîne û bi xwestekeke mezin berheman diafirîne. Demîrtaş, behsa wan rojan kir û diyar kir ku ji ber vê yekê zarokatiya wî gelekî bikeyf derbas bûye.

Ji şagirtiyê ber bi hostetiyê ve

Demîrtaş, behsa çîroka xwe ya hostatiya daran kir û destnîşan kir ku di sala 2007'an de hostayek çûye mala wan û berdestkê hosta tine bûye. Demîrtaş, da zanîn ku wî jî berdestiya hosta kiriye û hosta ji bavê wî re gotiye "kurê te gelekî jêhatî ye". Demîrtaş, da zanîn ku bavê wî jî piştî vê yekê ew şandiye ba hosta û wiha berdewamî da axaftina xwe: "Bavê min ji hosta re got, 'bibe ba xwe li senayiyê, bila fêrî kar bibe'. Wê çaxê ez hem diçûm lîseyê hem jî diçûm senayiyê û min wisa dest bi vî karî kir. Ez 5 salan di sanayiyê de xebitîm û pişt re di sala 2019'an de min li mala xwe atolyeyek biçûk vekir. Dû re min ev atolye mezinkir û derbasî cihekî berfirehtir bûm. Herî dawî jî min di sala 2021'an de Atolyeya Daran a Lotûsê weke firoşxaneyekê vekir. Ji bilî vê merengozxaneya min jî heye ku ez li wir berhemên xwe çêdikim û li firoşxaneyê jî didim pêşandan û difiroşim. Her wiha ji ber ku kûlîlka lotûsê di çiravan de di nava heriyê de şîn dibe û dişibe me, min ev nav li firoşxaneya xwe kir."

Teşe dide qurmikên daran

Demîrtaş, derheqê çêkirina darên berhemên xwe pê çêdike de agahî da û destnîşan kir ku ew darên weke berû, gurgen û gûz bi kar tîne. Demîrtaş, got ku ew ji bo berhemên xwe qurmikên van daran dikire û behsa nexşandina qurmikê jî kir. Demîrtaş, anî ziman ku ew van qurmikan dipîve, teşe didê û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Gava karê teşedanê yê qurmikê diqede pêvajoya firinkirinê dest pê dike û qurmika teşedayî diçe firina hilmê. Qasî hefteyekê ev qurmik di firina hilmê de dimîne û ava bi jehr ya darê tev di vê pêvajoyê de ji qurmikê derdikeve. Piştî ji firinê derdikeve qurmik hefteyekê bêhna xwe dide û dû re careke din tê pîvan. Ev qurmika ku careke din hat pîvan salek, du sal tê sekinandin da ku berhema jê tê çêkirin derz an jî xwar nebe. Piştî vê yekê ev qurmikên hatine sekinandin dibim xiratxaneya xwe û dikim berhem."

Dar xwezayî ye kîmyasalê tê nedin

Di berdewamiyê de Demîrtaş, bal kişand ser çêkirina berhemekê û bi lêv kir ku ewilî li ser qurmikê taslaka berhemê tê xêzkirin. Demîrtaş, destnîşan kir ku pişt re ew qurmikê dixe ber tornayê û teşeya berhemê didê. Demîrtaş, diyar kir ku piştî teşedanê ew berhema derdikeve holê cîla dike û ev tişt li axaftina xwe zêde kir: "Ez du qat cîlayê li berhemekê didim û ev cîla jî, ji bo temasa mirovan pêkan e û ne kîmyasal e. Ji bo tendirûstiya mirovan ti xetereya wê nîne. Jixwe dar bi xwe berhemeke xwezayî ye û nabe ku tiştekî kîmyasal bê lêdan."

Ji hunerê bêhtir sinehet e

Demîrtaş, karê xwe ji hunerê bêhtir weke sinehetê bi nav dike dibêje; "Huner û hunermend heke xurt be teşe dide civakê û rê nîşanê wan dide. Lê berhemeke em çêdikin dê çiqas rê nîşanî civakekê bide an jî dê ji bo pêşveçûna wê civakê çawa xizmet bike? Berhemên me tenê xîtabê zewqên gel dike, lewma ez karê xwe weke sinehet pênase dikim. Karê me bi daran pêk tê û dar hewayeke germ dide derdorê xwe. Lewma mirov jî berhemên bi daran tercîh dike. Her wiha ev berhem sed sal şûnde jî dê forma xwe biparêze û xerab nabe."

Berhemên xwe difiroşe dervayî welat

Demîrtaş, xwest ku ev kar bigihêje gelek kesan û diyar kir ku gava ew dibîne berhemeke wî li cihekî tê bikaranîn, gelek keyfxweş dibe. Demîrtaş, da zanîn ku ew berhemên xwe bi rêya medyaya dîjîtal difiroşe derveyî welat jî û ev tişt got: "Ez berhemên xwe difiroşim Tirkiyeyê jî, lê ji derveyî welat zêdetir sîparîş tên. Min berhemeke xwe di van rojan de şand Romayê. Çûyîna vê berhemê ya wir û bi çandên wir re jî têkiliya wê min gelekî keyfxweş dike. Ez nikarim vê yekê bi madiyatê vebêjim. Herî zêde jî daxwaz ji Amerîkayê tê, dû re Almanya û piştre jî Îngîltereyê daxwaza berhemên min pir in."

FERHENGA BIWÊJAN

Siha pelkê ye, ne li xwe ye, ne li xelkê ye:
- Ne bi kêrî xwe tê ne bi kêrî kesekî din tê.
(Pelk dareke e, rengê pelên wê bi ser spî ve ye)

Simbêl bi pisîkan ve jî hene:
- Ma hema her tişta simbêl pê ve hebe baş e?

Simbêlên çîçirkan jî hene:
- Bi heman wateyê.

Simaqa şûştî ye:
- Bi kêrî tiştekî nayê; bi kêrî karekî **nayê; beredayî ye:**
Ti kes ji mala bavê min nema Elîqorî **bû celebdarî:**
- Kesê bi kêrî kar were nema kar dan yê bi kêr neyê.

Tiroviro ye:
- Bi kêrî tiştekî nayê; beredayî ye; ne bedew e; bêserûber e; çewt e.

Tu benikê sor û zer bûya yî, tuyê bi derê hebana xwe ve bûya yî:
- Eger tu bi kêrî kar bihatayî, tuyê ne li vir bûya yî.

Tu bi hirî bûya yî, tuyê di nava kerî de bûya yî:
- Bi heman wateyê.

Tu tevê bi ser hev de bikutî, nabe sîr û pîvazek:
- Bi kêrî tiştekî nayê; nahêje ku mirov lê xwedî derkeve.

Ûrê her kesî nanê genimî naherisîne:
- Her kes bi kêrî her tiştî nayê; her kes nikare mezinayiyê bike.

Vala ye:
- Beredayî ye; bi kêrî tiştekî nayê; bêsûd e.

Weke pelê li nava gû ketî:
- Lewitiye; êdî bi kêrî tiştekî nayê.

Werîsê rizî ye:
- Ne yê baweriyê ye; beredayî ye.

Xêr tê de nîne:
- Bi kêrî tiştekî nayê.

Xir bi keran ve jî heye:
- Her kesê xirê wî hebe ne zilam e.

Yê roja xweş e ne yê roja reş e:
- Bi kêrî rojên giran nayê.

Zimanê wî tinebûya wê qijikan çavên wî derxistan:
- Ji axaftinê pêve bi kêrî tiştekî din nayê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

Bi kamîreya Dîlan Mulhim

Ezîzê ragihandina Azad; Azîz Köylüoğlu

Rojnamevan Devrîm Amed got ku qetilkirina rojnamevan û rêhevalê wan Azîz Köylüoğlu kiryareke dijmirovê û ne exlaqî ye û wiha got: "Azîz Köylüoğlu stûneke Çapemeniya Azad bû û mîrateya Gurbetelîyan dişopand."**R-6**

Rîhan Loqo: Armanca dewleta Tirk dagirkirina tevahî Rojhilata Navîn e

Koordînasyona Kongra Star Rîhan Loqo diyar kir ku armanca dewleta Tirk a dagirker ne tenê dagirkirina Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye, lê ew dixwaze ku Rojhilata Navîn bi tevahî dagir bike û wiha got: "Pêwîst e dewleta Tirk a dagirker li ser asta navneteweyî bê cezakirin."**R-5**

'Şoreşa jinê ne rojeke, lê siberoj e'

Endama Kongra Star a bajarê Amûdê Rewşen Hiso diyar kir ku ji kêliya destpêkirina şoreşê û heta roja îro êrişên dagirkeran li ser jinê nehatiye rawestandin, bi domdarî pêşengên şoreşê dikin armanca êrişên xwe, da ku di şexsê pêşengan de destkeftiyên şoreşê têk bibin û got, "Şoreşa jinê ne rojeke lê siberojeke."**R-2**

'Bendava me ye, xak jî xaka me ye'

Sumeya Mihemed di derheqê klîpa 'Bendava me ye' bi bîr xist ku hestên ku ev klîp çêkir yên kêliyên bûn û wiha got: "Em hunermendên civakê ne û pêwîst e em erka xwe ya civakî pêk bînin."**R-7**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1249 19-Sibat-2025 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

LI BENDAVA ŞEHÎDAN WÊ VÎNA GELAN SER BIKEVE

Êrişên qirkirinê yên dewleta Tirk û çeteyên wê yên li ser Bendava Tişrînê û Pira Qereqozaqê dewam dikin. Gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî, ji bo piştgiriya şervanên xwe û parastina bendavê ji êrişan, ji 8'ê Çileyê ve li gorî koman nobeta parastina bendavê dewir digirin. Israra gel a berxwedanê jî tekez wê bi serkeftinê tacîdar bibe, serketina berxwedana bendavê serketina wekhevî, demokrasî û biratiya gelan e.**R-4**

'Serdana Colanî ji Efrînê re bêwate bû'

Rêveberê Rêxistina Mafê Mirovan a Efrînê, Ibrahîm Şêxo da zanîn ku her du serdanên Colanî û karwanê Ewlehiyê ji Efrînê re şeklî bûn ji ber ku hîna bipêkirinên komên çete berdewam in û got, "Divê Colanî û hêzên navnetewî ji bo vekişandina dagirkeriyê û vegera koçberên Efrînê bi erkê xwe rabin."**R-3**

Ez jin im — Nehîr pale R-2
15'ê Sibatê 2025 — Farûk Sakik R-5
Tirkiyê, Sûriyê dixe nava şerekî nû yê navxweyî — Zekî Bedran R-5
Jiyana bi netew û civakî! — Rohat Bulut R-6
Pirrengiya çandî û rola wê di avakirina civakan de — Kemal Necim R-7

‘Şoreşa jinê ne rojeke, lê siberoj e’

Endama Kongra Star a bajarê Amûdê Rewşen Hiso diyar kir ku ji kêliya destpêkirina şoreşê û heta roja îro êrişên dagirkeran li ser jinê nehatiye rawestandin, bi domdarî pêşengên şoreşê dikin armanca êrişên xwe, da ku di şexsê pêşengan de destkeftiyên şoreşê têk bibin û got, “Şoreşa jinê ne rojeke lê siberojeke.”

Ronaz Silêman/Qamişlo

Pergala zilamê desthilatdar di hemû serdeman de bi kiryarên xwe yên li dijî hebûn û nasnameya jinan tevahî civakan mehkûmî koletî û serî tewandinê kiriye. Bi şidet û qetilkirina jinan re ku di heman demê de qerkirina civakê ye, hebûna xwe domandiye. Lê di sedsala 21’mîn de jinan bêhtir xwe bi rêxistin kirin û di hemû eniyên têkoşînê de bi rola pêşengiyê rabûn. Jin îro tola hezarê salan ji pergala mêrê desthiladar hiltîne û rêya jiyana azad bi ked, fedekarî û bi berdel xêz dike. Herwiha Şoreşa Rojava ya ku bi pêşengiya jinê hate destpêkirin, ji bo tevahî jinên herêm û cîhanê bû çavkaniya îlhamê. Hemû jinên xwedî lêgerîna azadiyê Şoreşa Rojava ji bo xwe wek qiblegeh dîtin û ji lehengiya jinên Rojavayî hêz û bawerî digirin.

Derbarê têkoşîna jin a di nava şoreşê de û parastina rola wê di hemû qadan de, endama Kongra Star a bajarê Amûdê Rewşen Hiso ji rojnameya me re axivî.

‘Azadiya jinê pêl bi pêl diherike’

Rewşen Hiso diyar kir ku heger em rewşa jinên Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûriyê binrxînin, ji her kesî re diyare ku jin berî şoreşa Rojava di çi rewşê de jiyan dikir û wiha got: “Berî hezarê salan bi hatina mêr li ser erşê desthiladariyê, êdî qonaxeke nû ya bindestiya jinê hate destpêkirin. Di vê qonaxê de qirkirina jinê pêk dihat. Qirkirina jinê gihiştibû lûtekeya herî jor. Her çiqasî jin têkoşîn û berxwedanî li hemberî hişmendiya mêr ê desthilatdar daye meşandin jî, lê gavên ber bi azadiyê nehatibûn avêtin. Lê bi avakirina Tevgera Azadiya Kurdistanê re, gava destpêkê ya ber bi azadiya jinê hate avêtin. Jina yekem ku cihê xwe di vê Tevgerê de girt, rê li hemberî azadiya hemû jinan jî vekir. Ji wê demê û şûn de azadî pêl bi pêl ber bi çar perçêyên Kurdistanê diherike. Şoreşa Rojava jî mîrasa herî mezin a jinê ye. Bi Şoreşa 19’ê Tîrmehê re jina kole bû xwedawenda qada civakê. Gavên dîrokî di aliyê jinê de hatin avêtin. Bingeha van gavan jî Rêber Apo bû. Rêber Apo mafê jinan da naskirin û riya têkoşînê li pêş me vekir.”

‘Hewl didin bi hedefgirtina pêşengan destkeftiyên şoreşê têk bibin’

Rewşen Hiso di berdewamiya axaftina xwe anî ziman ku qadên jiyanê bi rengê jinê dixemile û wiha got: “Sedsala 21’emîn bû sedesala jinê. Jin ev sedsala bi berxwedanî û têkoşîna xwe neqişand. Dengê xwe li hemberî desthilatdariyê rakir û Jin, Jiyan Azadî belav kir. Ev deng li Rojava hate derxistin û li cîhanê hate belavkirin. Jinên Rojava qad bi qad cih girt û li kêleka mêrê ku cihê wê tenê mal didît xebat da meşandin. Ev zêdeyî 12 salan ji têkoşîna me di nava şoreşê de. Ev têkoşîn jî ne bi hêsanî xwe gihand roja me ya îro, berdêlên giranbuha hatin dayîn, zehmetî û astengiyên mezin hatin jiyankirin, lê îradebûn hêza herî mezin a jinê bû. Ji xwe ji kêliya destpêkirina şoreşê û heta roja îro, êrişên desthilatdar û dagirkeran li ser jinê nehatiye rawestandin, bi taybetî dewleta Tirk a dagirker bi domdarî pêşengên şoreşê dikin armanca êrişên xwe. Armanc jî ew e ku di şexsê pêşengan de destkeftiyên şoreşê têk bibin û keda ku bi salan hatiye meşandin vala derxînin. Lê êdî jin bindestiyê nema weke berê hildibijêre û bêdeng dimîne, ji ber ku bi hezaran jinên ku bi Têkoşîna Azadiya Kurd û Têkoşîna Azadiya Jinê re xwe naskirin, bi têkoşîna zêdeyî 40 salan re bingeh û hîmê şoreşa ku îro li cîhanê bandor dike ava kirin. Di heman demê de agirê şoreşê bi destê jinên leheng hatiye pêxistin û wê bi destê jinan jî bigihêje serkeftinê. Ji ber ku Şoreşa jinê ne rojeke lê siberojeke.”

‘Azadiya jin û civakê misoger bikin’

Rewşen Hiso da zanîn ku yekîtiya

jinan ji bo vê serdemê mijara herî girîng e û axaftina xwe wiha qedand: “Piştî hilweşîna rejîma Eseed ku ew jî mîna hemû desthilatdarên berî xwe tu maf neda jinê, rêveberiyeke nû hate li ser desthilatdariyê, ew jî Rêveberiya Heyet Tehrîr El-Şam e ku ji aliyê Ebû Mihemed El-Colanî ve tê birêvebirin. Ev rêveberî jî hişmendiya wê, hişmendiya îslama tundrewe ya ku dixwaze jin cilên reş û girtî lixwe bikin. Herwiha cihê jin di nava xebatên siyasî, hiqûqî û hwd... de nequncaw dibîne. Em weke jin vê yekê tu carî qebûl nakin, di nava şoreşê de me weke jin da ispatkirin ku jin ne tenê di warê siyasî, hiqûqî, diplomasî, rewşenbîrî, rêveberî û hwd... kare bixebite. Lê di qada leşkerî de bibe pêşeng û mînak ji cîhanê re, ev yek hatiye isbatkirin û jiyankirin. Li ser vê bingehê banga min ji hemû jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û cîhanê heye ku em weke jin bi yetîtiya xwe hemû polîtîkeyên mêr têk bibin, da ku em azadiya xwe û civakê misoger bikin.”

Kombûna Jinan a Zenûbiya ji bo edalet û wekheviyê têdikoşe

Di demeke ku HTŞ’ya cîhadîst dixwaze Zenûbiya ku sembola hêza jinê ye ji navereka perwerdê derxe de, Kombûna Jinan a Zenûbiya ji bo çareserkirina pirsgirêkên jinan û parastina mafên wan têdikoşe.



Bi armanca çareserkirina pirsgirêkên malbat û civakê, bi taybetî jî pirsgirêkên girêdayî jinan ên wek zewaca di temenê biçûk de, hevberdan û wergirtina zarokan, Kombûna Jinan a Zenûbiya dixebite. Zenûbiya, hevkariya komîteyên lihevkirinê yên ku li gund û bajarên Dêrazorê yên mîna Hecîn, El-Basîra, Ebo Xeşeb, Cezra û El-Sur belav bûne, dike. Zenûbiya, ji bo pêkanîna edaletê di nava tekoşîn û berxwedanê de ye, hewl dide mafên jinan di nava civakê de biparêze û nehêle mafên wan werin binpêkirin. Endamên Kombûna Jinan a Zenûbiya têkildarî têkoşîna xwe ya ji bo parastina mafên jinan, ji ajansa JÎNHA’yê re axivîn.

‘Kombûna Zenûbiya pirsgirêkên jinan çareser dike’

Endama Komîteya Lihevkirinê ya Kombûna Jinan a Zenûbiya ya li Hacînê Heyat Ismaîl tekez kir ku tevî pirsgirêk û gefên ku mafên jinan binpê dikin, tekoşîna wan a parastinê didome û wiha got: “Tevî hemû astengî û pirsgirêkan, têkoşîna me ji bo parastina mafên jinan didome. Yek ji destkeftiyên ku Kombûna Zenûbiya bi dest xistiye jî, çareserkirina pirsgirêka jinek ciwan ji bajarê Laziqiyê ya Sûriyê ye. Ji bo zanakirin û hişyarkirina jinan em di nava xebatê de ne. Zextên civakî dihêle jin ji nasnameya xwe dûr bikevin. Ev jî pirsgirêkên jinan zêdetir kir. Jin ji qada siyasî û civakî hatin dûrxistin.”

‘Ji bo pêkanîna edalet û wekheviyê têdikoşin’

Rêvebera Mala Jin li herêma El-Kesra Seher Hesen Mustafa jî bal kişand ser têkoşîna ji bo çareserkirina pirsgirêkên jinan a di nava civakê de û got: “Pêwendiyên me bi komîteyên lihevkirinê re ji bo çareserkirina pirsgirêkên jinan berdewam in. Herî zêde em bi pirsgirêkên di navbera jin û mêr de, hevberdan û mafê wergirtina zarokan re rûbirû dimînin. Ev pirsgirêk jî li dadgehan bi rêya zagoanan tên çareserkirin û mafên jinan tên parastin. Bi rêya nîqaşan, me karîbû rêjeyên zewaca biçûk di van demên dawî de kêm bikin. Ji bo pêkanîna edalet û wekheviyê ji bo jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, em di nava tekoşînê de ne. Her wiha em hewl didin rola jinan di avakirina civakê de carek din aktîf bikin.” **JÎNHA**

Ji Pênûsa Jin

Ez jin im

Nehîr Pale

Di sîstema Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê de têkoşîneke xurt li hemberî zayendperestiyê tê kirin. Li tevahiya cîhanê bi qasî Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê derfet ji bo xebatên jinê nayê dayîn. Êdî bi şoreşa Rojava re dengê jina Ereb, Kurd, Turkmen, Ermenî, Çerkez, Aşûrî tê bihîstin. Mînaka herî mezin a vê yekê di hemû çalakiyan de dirûşmeya Jin, Jiyan, Azadî tê gotin. Pênasekirinên civaka zayendperest ji jinê re hêdî-hêdî ji holê têne rakirin. Jina ku bela dihat dîtin niha çavkaniya jiyan û azadiyê tê pênase kirin. Ji bo vê yekê têkoşîneke gelekî mezin tê kirin. Eger jin li hemberî zîhniyet û kevneşopiyên civaka zayendperest destê bi têkoşînê nekiribane îro nedigihîşt aşta ku çavkaniya jiyanê were pênase kirin. Berê jin ditirsiya ku gotina azadî bi lêv bike û ew neçar dikirin ku hemû kevneşopiyên civaka zayendperest pêk bîn in. Di bin navê jin namûs û şerefa mêr e û mulkê wî ye gelek rêbazên tûndrew li ser didan bikar anîn. Di ol de jî her tim jin sûcdar û gemar e ji ber vê yekê kevneşopiyên ku mêr diyar kirine li ser jinê têne ferz kirin.

Civaka zayenedperest têkiliya malbatî gelekî bêmrês kiriye, bavê ku ji keça xwe hez dike wî tînin rewşa di bin navê kevneşopiyan de keça xwe bukjê. Jina li ser kevneşopiyan nemeşe û hewl bide ku hebûna xwe diyar bike, tê red kirin. Lewma jin nikaribû bibêje ez jin im, ji xwe fedî dikir û ditirsiya. Di mejiyê jinê de diçînin ku ew sedema hemû pirsgirêkên civakî ye, ew ji bo xizmetkirina mêr tê dunyayê, ew bela serê malbat û civaka xwe ye. Tiştekî bedew di jinê de nehiştibûn, hemû tiştên girêdayî jinê gemar û pirsgirêk in. Heyanî niha jî dema ku civaka zayendperest û ol di mijara nêzîkatiya ji jinê re têne rexne kirin, qebûlnakin û li xwe mûkir nayên ku wan zulma herî mezin li ser jinê daye meşandin û neheqî lê kirine. Li gorî wan dema ku jin bixwîne û bizewicê ew hemû mafên wê didin wê, eger pêdiviyên wê yên kesayetî pêktînin bi demokrasiyê ve didin girêdan. Ev hemû jî bi kêrî jinê nehatin.

Niha li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê derfetên jinê çêbûne ku têbikoşe, xwe biparêze û hebûna xwe diyar bike. Tevlîbûna wê ya siyasetê, çareserkirina pirsgirêkên jin, perwerdekirina jinan, nêrînên xwe anîne ser ziman, buyîna şervan û rêveber ev hemû hêz da wê ku bê tirs û şerm bibêje ez jin im. Piştî hezar salan jin dibêje ez jin im û xwedî li nasnameya xwe ya siyasî û civakî derdikeve, êdî wê xwe lewaz nebîne, mêr ji xwe baştir nebîne û bawerî bide xwe. Dema ku jin bibe xwedî îrade û xwe birêve bibe wê demê wekheviya di navbera jin û mêr de wê pêk were. Heyanî ku jin lawaz be û nebe xwedî îrade civaka zayendperest wê destûr nede hebûna jinê û her tim wê biperçiqîne. Bi rêxistinkirin, têkoşîn û berxwedaniyê wê jin hebûna xwe diyar bike û dawî li zayendperestiyê bîne.

‘Bendava me ye, xak jî xaka me ye’

Sumeya Mihemed di derheqê klîpa ‘Bendava me ye’ bi bîr xist ku hestên ku ev klîp çêkir yên kêliyên bûn û wiha got: “Em hunermendên civakê ne û pêwîst e em erka xwe ya civakî pêk bînin.”

Zindan Şoreş/Qamişlo

Klîpa bi navê ‘Bendava me ye’ 8’ê Sibata 2025’an ji aliyê endamên TEV-ÇAND û Hûnergeha Welat bi alîkariya gelek berxwederên li Bendava Tişrînê hat çêkirin. Bi gotin û awaza hunermend Sumeya Mihemed stranekî gelêrî hatiye weşandin.

‘Klîpa binavê Bendava me hestên kêliyê hate çêkirin’

Di derbarê klîpa Bendava me yehunermend û Hevseroka TEV-ÇAND ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Sumeya Mihemed ji Rojnameya me re axivî. Sumeya Mihemed dîyar kir ku klîba binavê Bendava me ye ji derhênerê xwe bigire, heya gelê di nava klîbê de cih digirin ji berxwederên bendavê pêk dihat û wiha dest bi axaftina xwe kir: “Di destpêka ku ev pêngava berxwedana Tişrînê dest pê kir me jî weke TEV-ÇAND tevlîbûna xwe bi wê berxwedaniyê ragihand û hemû endamên me bi berhemên xwe tevlî bûn. Rêberê gelan Rêber Apo dibêjê “Hunermend pêşengê civakê ne.” Ev girîngiya ku Rêber Apo da çand û hûnerê. Em jî pewîste xwedi jê derbikevin. Ji ber ku hûnermendê şoreş ê, hûnermendê civakê ne. Ger di her aliyê civakê de pêşengî û piştgrî pêvajoyê neyê kirin, tê wate ya ku hêka ku qalkê wî vala be. Hûnermend civakî û gelêrî be û dermanê bîrîna civakê bike. Ji ber ku berxwedaniyekê bêhempa û pir girîng li bendava Tişrînê dihate meşandin, em jî weke hûnermend em jî dihat xwestin ku çalak tevlî her kêliyên pêvajoya ku heyi bibin. Di nav endamên TEV-ÇAND’ê de gelek berxweder şehîd û brîndar bûn. Yek ji wan jî şanogerê

mezin Cûma Xelîl ango bavê Teyar bû. Bi pêşengî, coş û kelecana xwe dilekî pir mezin di nav berxwederan de da avakirin. Li ser berxwedaniya ku îro tê meşandin efsûniye û destan tên nivîsandin. Dema ev berxwedanî çêbû hemû endamên TEV-ÇAND’ê ya Mezopotamya me weke erka herî mezin ji bona xwe dît ku em tevlî seferberiya gel bibin. Em weke Hûnergeha Welat me hewildan kir ku em di roja destpêkê de tevlî bibin lê derfet ava nebûn. Dema em çûn me şahidiya bi wê berxwedanê kir me xwest ku cihê wê de kedekê me hebe û bi alîkariya berxweder û gelê me yê wê derê berhemekê weke “Bendava me ye” derkete holê. Ji ber ku dîtîn û gotin ne weke hevin me biryar dan ku em cihê wê de klîbek wisa çêbikin. Gelek derhêner û hunermendên TEV-ÇAND’ê di wê klîbê de cih girtin û hevalên weke Mehmûd Berazî û Şêro Hindê kedek mezin ji bona weşandin û çêkirina klîba Bendava me ye dan. Nêrînek hevbeş û komînal derket ku ji bona ev kar hat meşandin. Em dîsa dubare dikin û dibejin em weke hunermend dilê û can kêleka hêza xwe ya QSD û YPJ’ê ne. Ji ber ku QSD’ê zarokên me ne xwişk û birayên me ne û ev ked didin ji bona parastina pêşeroja me gelê tevahî Sûriyê. Em deyndarê wan in û heya dawî yê jî em ê keda wan xwedî jê derbikevin. Ji ber wê ev klîb hat avakirin û ji bona me jî perwerdekî xurt bû. Berxwedana Bendava Şehîdan berxwedana hemû civakê ye û berxwedan jîyan e.”

‘Ev klîp li Bendava Tişrînê hat çêkirin, lê zimanê civaka tevahî gelê heremê de tê bihîstin’

Sumeya bîbirxist ku klîba Bendava me ye ji ber ku stranekî gelêrî ye, di jê hêstên demê de hatiye gotin rastî eleqeyek mezin ya civakê hatiye û wiha berdewam kir: “Ev çend rojin ev klîbe hat weşandin û demê wî 2 xulek derbas nekir jî lê kêliyê de kete li ser zimanê herkesî. Ji ber ku gelêrî bû û bi hestên kêliyê hatibû avakirin. Ji temenê piçûk bigire heya kalê 70’ê salî ev strane pir bi eleqedar û keyfxweşî pêşwazî kir. Dema em bandora klîbê ya çêkiriye dîbinin weke hûnermend û kedkarê klîbê em pir hestiyar û şanaz dibin. Em dizanin ku me berhemekî xurt dîyarî li wê civakê kiriye. Yên ku ev stranê guhdar dikin û dibêjin “We rastî ev klîb li Bendavê amade kiriye?” Ji ber ku ev pirse bandora ragihandin û çapemeniya alîgir ya şerê taybet e û hewildidin gel pê bandor bikin. Ji ber ku dewleta Tirk ya dagirker li ser çapemeniya vê ye ya şerê taybet de, hertim digot me Tişrîn girt û hêzên me tê de ye. Em jî weke hunermend ji bona derew û xapandinên dewleta Tirk nîşanî gel û raya giştî bidin çûn Bendava Şehîdan û klîb çêkir. Ev jî aliyê gel ve bi baldarî hat dîtin û digotin êdî em li bawerin em ê serbikevin. Ji ber ku stran û huner berhemên hestên gel yên welatparêzî û perwerî yê ne. Pêwiste di wê pêvajoyê de erka ku dikeve li ser milê me hemûyan bê pêkanîn.”

‘Em ê demên pêş de jî stranên şoreşê amade bikin’

Sumeya got ku dê plansaziyên wan yê aliyê hunerî de berdewam bikin û wiha axaftina xwe qedand: “Weke TEV-ÇAND ya Mezopotamya berê jî gelek stranên me li ser berxwedana dîrokî ya ku tê meşandin de hatibû çêkirin. Komên me yên strana Koma Cudî, Koma Hozan û Koma Heleb jî di nav wî berxwedanê de çalak cih digirin û dê amadekariya klîbekê nû dikin. Em ê ji bona Bendava Şehîdan stranekî nû derbixin. Ne tenê stran di heman demê de belgefilm û şano jî li gelê ku berxwe dide û têkoşîn dike ra tên pêşkêşkirin. Em çiqasî bikin jî em nikarin deynê wan şervan û gelê şoreşger bidin. Dîsa dubare em dibêjin di serî de şehîd bavê Teyar, hemû şehîdên Bendava Tişrînê cane xwe feda kirine bibîrtînin û em soz didin ku mîrateya wan dê bê parastin.”

Amadekarî û pêşkeşiya klîpa Bendava me ye

Ekîpa hunerî û teknîkî ku cihê xwe di kilîbê de girtiye wiha ye:
Gotin&Awaz : Gelêrî
Stranbêj : Sumeya Mihemed
Kamîra : Roder Dimilî û Welat Seîd
Aranje : Îvan Hindê
Chord : Serxwebûn Zeyno
Mix : Kawa Xalid
Ekulele&Qopiz : Yûsif Osman
Guitar Bass : Hozan Wezîr
Edit : Danyar Taj
Koro : Yezen el Tuma-Demhat Elî-Hozan wezîr-Yûsif Osman
Edit&color : Roder Dimilî
Derhêner : Şêro Hindê -Mehmûd Berazî
Digital media : Delîl Xalid

Şêrîn Ebdulbaqî: Muzîk tîmara ruh e

Hêvî Keleş/ Qamişlo

Stranbêja kurd Şêrîn Ebdulbaqî diyar kir ku mirov dikare bi riya muzîkê hestên xwe parve bike û wiha got:”Muzîk dibe weke tîmar ji rih re.”

Di parastina çand, huner û nirxên gelê Kurd de Hunermendên jin ên Kurd rolek mezin lîstine û di gelek qadan de bûne xwedî rol. Jinên Kurd ji bo parastina mîrata çandî ya Kurdî kedeke mezin dane. Di heman demê de li Rojavayê Kurdistanê bi Hunermendên xwe yên ciwan dewlemend e, bi taybet jin û zarok, Şêrîn Ebdulbaqî jî yek ji wan jinên ku li Rojavayê Kurdistanê ye, bi huner û sekna xwe karî dengê jina azad belav bike.

Di derbarê jiyan, kar û xebata xwe de stranbêja kurd Şêrîn Ebdulbaqî ji Rojnameya me re axivî.

Kurte jiyana Şêrîn

Şêrîn Ebdulbaqî diyar kir ku ew di sala 2000’an de li bajarê Qamişlo ji dayîk bûye xwendina xwe li wir qedandiye û wiha got:”Di sala 2019`an de piştî ku min xwendina xwe bi dawî kir êdî ez bi karê ragihandinê ve mijûl bûm û di Ajansa NÛ JINHA de weke nûçegihan kar dikir û heta niha jî karê xwe berdwam dike. Em ji malbatek stranbêjin ku bi dengê xwe yê xweş tên nasîn, ji zarokatiya xwe ve girêdana min bi muzîkê ve heye û jê hez dikim. Lê ji ber mijûlbûna min bi xwendinê re min gelekî bala xwe nedida muzîkê. Piştî ku ez ketim nav karê ragihandinê de, êdî min xwest ku di ber karê xwe re talenta xwe jî li pêş bixim. Di heman demê de min rûpelek li ser instagramê çêkir û dîmenên kurt yê stranbêjiyê li ser

belav kir. Di demek kin de gelek kes ji kesayet û dengê min hezkirin û wan piştgiriya min kir. Destpêka mijûlbûna min bi stranbêjiyê re malbata min jî destek dida min, lê bi israr xwe jî min karî ku vê yekê bi wan bidim qebûl kirin.”

‘Awaz û stran dermanê hemû birînan e’

Stranbêja kurd Şêrîn Ebdulbaqî axaftina xwe berdewam kir û wiha got:” Stranbêjî aramiya canê mirov e, her mirovekê bi rengekî cuda ji muzîkê hezdike. Piştî Şoreşa Rojava stranên kurdî bêhtir hatin gotin û guhdarkirin. Di heman demê de bi saya vê şoreşê ciwanên mîna min karîn xwe isbat bikin û di civakê de roleke girîng bilîzin. Herwiha di Rojavayê Kurdistanê de gelek komên jinan ên hunerî çi di milê stranbêjiyê, muzîkjenî û wênexêziyê de hatin avakirin. Ev şoreş ji bo her kesî derfetek bû ku bi riya wê xewin û xeyalên xwe pêk bînin. Hêviya min ew e ku her kesê xwedî xeyal, dev ji xeyalên xwe bernedin û çiqasî rastî astengiyan jî werin pêwîste riya xwe berdewam bikin, ji ber ku her tişt bi israrê pêk tê. Ji ber dema ku min jî dest bi vê riyê kir nakokî li cem min hebûn ku ez bi ser nekevim, lê bi israra xwe min karî ez vê riyê berdewam bikim û em hunermend bikaribin vê civakê biguherînin da ku em nifşekî azad bidin avakirin.”

Têbînî

Pirrengiya çandî û rola wê di avakirina civakan de

Kemal Necim

Pirrengiya çandî yek ji egerên herî girîng ên pêşketina civakî ye, ji ber ku Pirrengiya çandî civakên vekirî û nûjentir diafirîne. Her çiqas carna hin cudabûn û pirrengiyên civakî dikarin bibin sedemên nakokî û arîşeyan jî, lê pirrengiya çandî dikare bibe egera civakên aram û lihevhatî.

Pirrengiya çandî simgeyeke civakên têkel û pirreng e, civakên ji nîjadên cuda, zimanên cuda, olên cuda ku li heman erdnîgariyê bi hev re dijîn. Pirrengiya çandî tê wateya pirrengiya adet, kevneşopî, ziman, ol û baweriyên di nava civakekê de, ku hêmaneke bingehîn e ji bo pêkhatina nasnameya neteweyî û pêşvebirina hevjiyana aştiyane.

Li welatekî weke Sûriyeyê ku dewlemendî û cihêrengiyeke xweşik ya gel, netew, ol û çandên cuda ye heye jî, lê ji ber politîkayên kevneperest, nîjadperest, çewisandin û hewldanên asîmlekirinê, ev cihêrengî nebûye egera civakeke xweşik, lihevhatî û nûjen. Berovajî wê pir caran bûye egera kîn, nefret û parçebûnê.

Di rewşa îroyîn de ku Sûriyeyê ber bi pêvajoyeke nû ve diçe, pir girîng e ku çandên cuda nêzî hev bibin û bibin bingeha siberojeke nû. Pirrengiya çandî di civakan de hişmendiya lihevhatin û lêborînê pêş dixe, dibe alîkar ku asoyên kesan fireh bibin û têgihiştina wan ji hev re zêde bibe. Dema ku mirov bi çandên cihê re têkilî daynin, bêhtir dikarin ramanê hev, ezmûnên hev nas bikin û pê re lihev bikin, ev yek nakokiyên civakî kêm dike. Her wiha pirrengiya çandî dibe hêmana afrênerî û avakirinê. Civakên ku di hêla çandî de cihêreng in xwedan hawîrdorek dînamîk in, ev jî derfetên afrêneriya di warên huner, zanîst û teknolojiyê de xurt dike. Di dîrokê de, bajar û civakên ku xwediyên cihêrengiyeke çandî ya mezin in bûne navendên nûjenî û pêşkeftina şaristanî.

Yek ji encam girîng ên pirrengiya çandî, çesipandin û avakirina nasnameya nîştimanî, yan jî rêgeza hemwelatîbûnê ye. Pirrengî li şûna ku bibe faktorek dabeşker û cudaker, ger bi rêkûpêk were rêvebirin dikare bibe hêmanek yekkirina civakê. Ew jî bi rêya pêkanîna polîtîkayên berferh ên ku rêz û hurmetê ji çandên cuda re digrin, pêk tê. Ev yek wê rê li ber civakê veke li ser bingeha piralî û xwebûna hevpar nasnameya nîştimanî û ya hemwelatîbûnê ava bike.

Lê bêguman pir sedem hene ku rê nede civakan karibe pirrengiya çandî bibke faktora lihevkirin û geşepêdanê. Ji wan sedeman tundrewî, netewperestî û nîjadperestî ne ku dikare bihêle hin civak li dijî ên din cudakariyê û çewisandinê bikin. Carna jî hin civakên ku xwe lawaz dibînin, ji tirsa ku nasnameya xwe ya çandî jidestê bidin xwe ji civakên din didin alî û bi tenê dimînin.

Ji bo ku pirrengiya çandî bibe dewlemendiyeke xweşik û nûjen, divê rêbazên perwerdeyê li ser bingehê cihêrengî û pirrengiyê bêne amadekirin û şagirt bêne fêrkirin ku rêzê li çandên cuda re bigirin. Her wiha divê hikûmet û rêveberî zagonên ku mafên çandî diparêzin saz bikin, her wiha di qada huner û ragihandinê de jî divê cih bidin hemû çandên cuda û di nava civakê de jî çalakiyên hevbeş, platformên diyalogê di navbera hemû beşên civakê de bêne lidarxistin.

Ezîzê Ragihandina Azad; Azîz Köylüoğlu

Rojnamevan Devrîm Amed got ku qetilkirina rojnamevan û rêhevalê wan Azîz Köylüoğlu kiryareke dijmirovê û ne exlaqî ye û wiha got: “Azîz Köylüoğlu stûneke Çapemeniya Azad bû û mîrateya Gurbetelîyan dişopand.”

Argêş Viyan/Qamişlo

Xebatkarê çapemeniya azad û lêgerînerê heqîqetê Azîz Koylûoglû di 27’ê Çileya 2025’an de li herêma Ranya ya Silêmaniyê di encama êrîşa dewleta Tirk a dagirker de şehîd ket. Xebatkar û rojnamevan Azîz Koylûoglû ku 32 sal li çar parçeyên Kurdistanê ji bo rastî û heqîqetê derbixe ronahiyê, di sala 1976’an de li navçeya Xana Axpar (Çinar) a Amedê ku paytexta qehremanî û berxwedanê ya Bakurê Kurdistanê ye ji dayik dibe, bi kedkarî û qehremantiya xwe li ser tevahî xaka Kurdistanê dihat naskirin û navdar bû.

Derbarê jiyana rojnamevanê di aliyê dewleta Tirk ve hate qetilkirin Ezîz Köylüoğlu û êrîşên li ser rojnamevanan Rojnamevan û rêhevala wî ya têkoşînê Devrîm Amed ji rojnameye me re axivî.

‘Jiyana Ezîz Köylüoğlu, tabloyeke ked û xebatê bû’

Devrîm Amed diyar kir ku Ezîz Köylüoğlu di asta jiyanî û pîşeyî de mînak bû û wiha dest bi axaftina xwe kir: “Heval Ezîz Köylüoğlu bi navê xwe yê tevgerî (Kemal) ji Bakurê Kurdistanê bajarê Amedê ji malbateke welatparêz û kedkar ji dayik dibe. Xwedî ezmûnên salan yê jiyanî û pîşeyî bû. Hevalên weke hevalê Ezîz, naskirin û bi wan re xebat kirin bi rastî jî bi serê xwe pisportiyeke mezin e. Xwegihandina asta weke hevalê Ezîz bi rastî jî kedekî pir mezin tê xwestin. Ev ked jî, encama têkoşîna gel û Tevgera Azadiyê ye. Min hevalê Ezîz di sala 2004’an de li Herêmên Parastina Medya naskir. Wê demê jî heval karê ragihandina Navenda Parastina gel dimeşand. Şer û pevçûnên li qadê dimeşiyan kêlî bi kêlî ji raya gištî re radigihand. Ji ber ku ew di malbateke welatparêz de ji dayik bibû naskirina wî ya Tevgera Azadiyê zêde ne zehmet bû. Bavê heval Ezîz jî, şoreşgerekî kevnar û navdar bû, ji ber ku malbatê kar û xebata tevgerê dikir hevalê Ezîz di temenekê piçûk de, dîl dikeve destê dewleta Tirk ya dagirker. Ji ber zext û zordariya dewleta Tirk ya dagirker berê xwe dide herêmên azad. Di sala 1994’an de tevlî Tevgera Azadiyê dibê. Di salên destpêkê de, hevalên derdorê wî ji jêhatîbûn û tevgerbûna wî re dibin şahid. Vesazîya wî ji bona kar û xebatên ragihandinê çêdibe û jiyana wî pir balkêş û bibandor bû. Herwiha ji hevalên derdorê xwe re pir mijûl dibû. Dema destpêkê min dît sekna wî bala min kişand. Di sala 2005’an de tevlî akademiya ragihandinê ya pîşeyî ya bi navê pêşenga ragihandina azad Gûrbetelî Ersoz bû û ew rêveber û mamosteyê me bû. Em 30 heval di wê demê de berendamê rojnamevaniyê bûn û em bi saya keda heval Ezîz niha endamên Ragihandina Azadin. Rûxmê ku hevalê Ezîz dibistanên pergalê nexwandibû jî, lê xwe pir pêşxistibû. Li ser civak û dîroka kurdî pir analîz û nîvîsên wî hebûn. Hevalê Ezîz evîndarekî lêkolîn û fêrbûyinê bû û pir jîr û serkeftî bû. Di pergalên dewletî de mirovek ji bona bibe rojnamevan gelek zanîngeh û dibistanan derbas dikin, lê hevalê Ezîz xwe bi hişmendiya Rêber Apo dagirtibû. Di malbatê de jî ji ber tenê bû berpirsyariya civakî di temenekî hîn ciwan de rakiribû ser milê xwe. Hevalên derdora wî jî hertim ji pêşketina hevalê Ezîz bandor dibûn. Kêmasîyên me yên hindirê akademiyê de bi me dida naskirin. Ûslûb û şêwaza wî yê naskirina kêmasiyan jî, bi serê xwe ji bona me perwerde û ezmûn bû û hevaltiya me pir berdewam kir. Me di qadên cûda yên ragihandinê bi hevre kar meşand. Hevalê Ezîz di anva tevgera azadiyê de bi navê Kemal dihate naskirin û bi rihê Kemal Pîran xwe Ezîz kiribû. Di pêşxistin û danasîna şoreşa Rojava de jî kedek hevalê Ezîz pir mezin çêbû. Dema ku çeteyên DAIŞ’ê êrîş li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê kirin, kêlî bi kêlî rastî diragihandin.”

‘Bi dilekî wêrek li hemû beşên Kurdistanê kar û xebatên ragihandinê dan meşandin’

Devrîm Amed anî ser ziman ku rêheval Ezîz Köylüoğlu li hemû beşên Kurdistanê ji bona dengê civaka kurd bigihîne raya gištî kar û xebatên pir girîng kirine û got: “Hevalê Ezîz ji herêmên Parastina Medya bigire, heya ji bona qêrînên qirkirina Êzidiyên li Şengalê rûbirûyê qirkirina çeteyên DAIŞ’ê hatin xwe gihand hawara wan. Di aliyê pîşeyî û qadên cûrbecûr weke dîtbarî, radyo û ajansên giredayi Ragihandina Azad de kar û xebat dida meşandin û bû dengekî ji dengê rastiyê. Bi rastî jî heval Ezîz xwe gihandibû asta Ezîziyê. Heval Ezîz hem xwe perwerde kir û hem Ragihandina Azad mezin û xurtkir. Gelek nifşên nû yên ji aliyê Ezîz ve hatin perwerde kirin, niha li ser şopa wan dengê rastiyê dinivîsînin û didin fêrkirin. Herwiha li Kampa şehîd Rûstem Cûdî ya Mexmûrê jî salên dirêj kar û xebat dane meşandin. Civaka Mexmûrê ew weke zarokê xwe didîtin û dengê penaberên azadiyê bi cîhanê da bihîstin. Li wê derê di rojnameya Mexmûrê de heya asta Edîtoriyê cihê xwe girt. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, gelek sazî û dezgehên ragihandinê ji nûve ava kirin û parastina deskeftiyên şoreşê jî erkekê mezin da li ser milê xwe. Pîştî şahadeta wî hate ragihandin hevalên ku ew nas dikin û navê wî bihîstibûn jî hêrs û xemgîn bû û pir bi şahadeta Mamoste Ezîz bandorbûn. Ji ber ku mirov ji bona ku kesayetên weke Heval Ezîz nas bike pêwîst nake ku mirov ew dîtibe, ji ber ku bandora xwe li ser her kesî hištibû. Şagirtên xwe ne tenê di aliyê pîşeyî de pêş dixistin, di heman demê de ji milê jiyanî ve jî ew perwerde dikirin. Di jiyana xwe de pir cîdî û bidisplîn bû. Çiqas zane bû, ew qasî jî hestiyar bû. Derdorê xwe fêm dikir û ew didan fêmkirin. Şopdarê Seyîdan bû, bibû bîra civakê. Analîz û dahûrandinên wî pir xurt bûn. Kirdeyê têkoşîn û şoreşê bû. Armanckirina hevalê Ezîz Köylüoğlu, pir vekirî û hatibû plansaz kirin. Di pêvajoyekî ku li gel Rêberê gelan Rêber Apo hevdîtin tên kirin û şahadeteke wisa pir jî mere giran û zehmet bû.”

‘Weke bijîşkekî civakê her derman li gel heval Ezîz peyda dibû’

Devrîm destnîşan kir ku jiyana Ezîz Köylüoğlu mînaka pêşxistina jiyana azad bû û wiha got: “Hevaltiya Ezîz hevaltiyeke pir sade û paqij bû. Nîqaş yan jî nêrandinên wî yên jiyanê pir xurt û fêrker bûn. Ji ber ku dihat hezkirin hevalên derdorê wî navê musteşar Kemal lêkiribûn, ev tê wateya şêwirmendiyê. Her hevalekî/ê derdorê wî ji hevalê Ezîz şewir dikir û nêrînên wî digirtin ji ber ku şêwirmendekê civakê bû. Bijîşkekî jiyanî bû her cûre derman li gel wî peyda dibû. Em çi bêjin li ser hevalê Ezîz kême û ne têrker e. Hevalê Ezîz xwe fedayî jiyana gelê Kurd kirbû û xwe gihandibû asta pisporiya jiyan ê. Hêviya wî yêkbûyin û yekîtiya gelan û azadiya Rêber Apo bû.”

‘Em şopdarê pênûsa Nazim, Cîhan û Ezîza ne’

Devrîm êrîşên li ser hevalên wan yên rojnamevan şermezar kir û axaftina xwe wiha qedand: “Êrîşên dewleta Tirk ya dagirker li ser rojnamevan û pêşengên Ragihandina Azad armanca wê qutkirina dengê rastiyê û veşartina kiryarên xwe yên gemar û qirêj yên ku li ser civakê pêktînin. Beriya niha jî hevalên me yên ku berxwedaniya li Bendava Tişrînê dişopandin Cîhan Bilgîn û Nazim Daştan jî hatin qetil kirin, di heman demê de, dîsa li Başûrê Kurdistanê û li bajarê Raniya yê girêdayî Silêmaniyê hevalên me, Gulistan Tara û Hêro Bahadîn bi destê dewleta Tirk ya dagirker hatin qetilkirin. Ev êrîşên dagirkeriyê ne ji ber xwe tên kirin. Gelek hêz li paş van êrîşan hene û çiraya kesk jêre tê pêxistin. Lê bila dewleta Tirk ya dagirker ji bîr neke, em ji şahadetan hêz digirin û ji nûve biryara me ya têkoşînê xurtir dibe. Yek Ezîz digihêje asta şahadetê yek Cîhan diçe bi hezaran cihê wan dadigrin. Em hertim şopdarên pênûsa Nazim, Cîhan, Gulistan û Ezîza ne. Em ê pênûsa rêhevalên xwe yên dengê rastiyê li erdê nehêlin. Em hevalên xwe Nazim, Cîhan, Gulistan, Hêro û di êrîşa herî dawiyê de jî mamoste û kedkarê ragihandina azad Ezîz Köylüoğlu bibîrtînin û bejna xwe li ber wan ditewînin û soza şopandina rêya wan didin.”

Xwenasîn

Jiyana bi netew û civakî!

Rohat Bulut

Civak her tim heyîneke zindî ye. Bi hemû heyîna xwe zindîbûna xwe ya madî û manewî radixe ber çavan. Bi qasî heyîna fîzikî, heyîna manewî jî gelekî girîng e. Heke manewiyata civakekê nebe ji xwe civakbûyîn nabe. Dibe ku mirov wekî her zindîwarekî bijî. Lê belê tişta ku mirov ji zindîwarên din cuda dike ew heyîna wî ya manewî ye. Her kiryar û bermahiyên mirov û civakê encama hilberîna manewiyatê ye. Heke mirov ji manewiyata xwe dûr bikeve, madiyata wî yanî heyîna wî ya fîzikî bi serê xwe civakbûyînê ava nake. Ji ber vê yekê pêwîste ku her mirov girîngiyê bide manewiyata xwe ya civakî û biparêz e.

Civakbûyîn li ser nirxên manewî yên ji dîrokê bi mirovahiyê re pêş ketiye û heta roja me ya îroyîn hatiye. Mirov çiqasî di ferqa wan nirxan de ye. Ew nirxên ji bo civakê jiyanî ne. Heke nirxên manewî yên civakî nebe koma ji mirovan pêk tê û hebûna wan a li cem hev bi serê xwe tiştekî îfade nake. Ji ber vê yekê her nirxên mirovî/civakî yên madî û manewî divê bê parastin. Di destpêkê de ew ehlaqê civakbûyên pêk tîne û bi hezaran sal e ku heta roja me ya îro civakbûyîn li ser piyan hiştiye divê were parastin. Lewre ehlaq bi xwe hevgirtin, yekîtî, kombûyîn û komunalîteyê pêş dixe. Lê belê ehlaq bi tena serê xwe têr nake, pêwîstî bi wijdan jî heye. Heke bi mirovekî re wijan nebe ne pêkane ku ehlaq jî hebe. Angu em dikarin li vir bêjin wijan bi xwe ehlaqê mirov bi rêxistin dike.

Heke mirov ji bo netew û civaka xwe manewiyata xwe xurt neke zehmete ku bi netew û civaka xwe re bijî. Tenê heyîna fîzikî bi serê xwe nabe. Ji bo hebûna xwe ya di nav civakê de biparêze pêwîste manewiyata xwe ya civakî biparêz e. Parastina manewiyata civakî jî dibe sedema parastina civakbûyîna madî. Angu hevdû temam dikin, yek bê ya din nabe. Lê belê dema em berê xwe didin mirovan em dibînin ku berjewendiyên erzan yên şexsî ji bo xwe esas digirin. Tenê xwe difikirin û ji bo berjewendiyên takakesî dikarin berjewendiyên neteweyî û civakî binpê bikin. Ev rewş gelekî xeternak e û bingeha tunebûna netewî û civakbûnê diafirîn e.

Li pêşberî berjewendiyên takakesî pêwîste helweşta li ser xeta manewiyata netewî û civakî derkeve pêş. Helweşteke bi ehlaq a civakî dikare pêşî li xeteriyên tunebûnê bigire. Naxwe dê ew civaka ku manewiyata xwe winda bike dê heyîna xwe ya madî jî winda bike. Ji bo pêşîgirtina li tunebûnê pêwîste her ferdê civakê bi wijdanî tevbigere. Îro dema em berê xwe didin netew û civaka Kurd gelek tiştên ku wijdanê mirov diêşîne û aciziyekê dide afirandin heye. Ji bo mirov neêşe û neêşîn e pêwîse her mirov bi erka xwe ya neteweyî û civakî rabe. Her Kurdekî ku hinekî li ser kesayet û rastiya xwe bifikire dê bi zelalî xwe nas bike û tişta ku jê tê xwestin bibîne.

Em di wê baweriyê de ne ku bi cih anîna berpirsyariya neteweyî û civakî dê bi xwe re gelek tiştên xweş jî bîn e. Mînak jiyanek bi rûmet û azad. Gelo tiştek ji jiyaneke azad û bi rûmet xweştir heye? Heke tunebe wê demê divê em her ferdên civakê ji bo jiyana bi rûmet tevbigerin û berjewendiyên şexsî deynin aliyekî.

‘Serdana Colanî ji Efrînê re bê wate bû’

Rêveberê Rêxistina Mafê Mirovan a Efrînê, Ibrahîm Şêxo da zanîn ku her du serdanên Colanî û karwanê Ewlehiyê ji Efrînê re şeklî bûn ji ber ku hîna bipêkirinên komên çete berdewam in û got, “Divê Colanî û hêzên navnetewî ji bo vekişandina dagirkeriyê û vegera koçberên Efrînê bi erkê xwe rabin.”

Hemza Sêvo/ Qamişlo

Pîştî 7 salan ji dagirkirina Efrînê, rûxandina rêjîmê, hatina hikumeteke nû, hîna jî kiriyarên bipêkirinan didomin, mijara serdana Colanî û derbasbûna karwanê ku derbasî Efrînê bû di rojevê de ye û pirsekê di xeyala her kesî de diafirîne ew jî gelo ma wê tu encamên baş ji van serdanan derkevin? Derbarê heman mijarê Rêveberê Rêxistina Mafê Mirovan a Efrînê, Ibrahîm Şêxo bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

Pîştî guhertina rêjîma Sûriyê, gelo rewşa herêmên dagirkirî çiqasî hat guhertin û niha rewşa welatiyan çawa ye?

7 sal in ji destpêkirina dagirkirina bajarên kurdî û dikeve sala xwe ya 8’emîn de, Efrîn di 2018’an de paşê Girê Spî û Serêkaniyê di 2019’an de. Li van herêmên dagirkirî ji wê demê ve heta roja îro bipêkirin ji hêla komên çete û dewleta Tirk ve tên domandin. Pîştî rûxandina rêjîmê û hatina desthilatdariya nû re valahî çêbû û kiriyarên dagirkeriyê pirtir bûn. Tevî ku desthilatdariyeke nû hat û serkirdeyên wan çeteyan weke Ebû Emşa tevlî artêşa nû bûn, lê rewşa herêmên dagirkirî nehat guhertin. Dema ku behsa deverên dagirkirî û kiriyarên ku li ser xelkên wê tên kirin jî hikumeta HTŞ’ê dibêje demek jê re tê xwestin hetanî ku em li ser bisekinin û çareser bikin. Ev tê wateya ku heya dagirkeriya Tirk hebe, HTŞ’ê nikare destwerdanê bike. Divê em bînin ser ziman ku hîna nêzî 2 hezar û 300 efrînî çarenivîsa wan ne diyar e. Piraniya wan girtî û revandî ne, li Efrînê hejmara zindanên ku tên naskirin 20 zindan in, weke Zindana Reş a Rajo û hwd… welatî bi riya girûpên Polîsên Leşkerî yên ku Cemal Ehmed Kebso li ser disekine, tên desteserkirin, Cemal Kebso ji Til Rifeet e. Dibe ku hin kesên girtî, zindanên Tirkiyê de bin an jî di zindanên din ên Sûriyê de bin. Me dît ku çawa hemû girtiyên Zindana Seydnaya û yên din hatin berdan, lê vaye bi hezaran ji kesên herêmên dagirkirî bi taybet ên Efrînê di zindanên çeteyan de ne. Ev demeke hin şêneyên Efrînê ji zindanan tên berdan, lê ev yek bi sedan Dolarên Amrîkî heta 2 hezar dolar bi riya malbatên girtiyan tên berdan.

Pîştî gera yekem a artêşa nû û gera yekem a Colanî ji Efrînê re, gelo kiriyarên dagikeriyê di çi astê de didomin?

Wekî me dît nû di 6’ê Sibatê de karwanekî ku ji 60 erebeyan pêk dihat ên Ewlekariya Gištî derbasî Efrînê bûn. Di kêliyên destpêkê de milet kêfxweşiya xwe anî ser ziman û hêviya wan ew bû ku komên çete werin derxistin. Lê mixa bin ev yek derbasbûneke şeklî bû, ji ber ku pîştî derketina karwanê wan, komên çete 30 kes ji Mabeta desteser kirin. Sedem jî ew bû ku gel kêfxweş bû û rahişt ala kurdî, bi vê yekê dîsa kêfxweşiya welatiyan şikest. Di wê demê de me dît ku dîsa rewş weke xwe ma û tiştek nehate guhertin. Pîştî ku serokê nû yê Sûriyê, Colanî hat Efrînê, gel dît, gel jî daxwaza berdana hemû girtiyan û derxistina çeteyan kir. Lê dîsa em dibînin ku Colanî dibêje mijara Efrînê dem jê re pêwîst e, bi vê yekê jî tê xuyakirin ku her du serdanê ku çêbûn, gerên şeklî bûn. Hêviya me ne di van dinerin û li benda wan in ku wê çi bikin. Di dema heyî de desteserkirin, talankirin, dizîn û kuştin li Efrînê didomin. Komên çete bi şevan êrişî malên efrîniyan dikin û malên wan talan dikin. Mînakên binpêkirina pir in lê nemaze, wê şevê çeteyan êrişî gundê Endarê kirin, kalemêrek û hevjîna wî girêdan, mala wan talan kirin û pereyên wan dizîn.

Heta ku koçberên ku ji herêmên dagirkirî bi darê zorê hatine derxistin vegerin cih û warê xwe, pêwîste çi were kirin?

Wekî em dizanin bi hezaran şêneyên Efrîn, Serêkanî û Girê Spî bi darê zorê hatine koçberkirin, hîna jî bendewarên vegera ax û warê xwe ne. Hêviya koçberan bi vegera warê xwe heye,

hin malbat vedigerin malên xwe lê rastî îşkenceyê tên. Lewma jî divê hikumeta nû ya Şamê û Ehmed Elşeri` ji bo mijara vekişandina dagirkeriyê bi erkê xwe rabin. Herwiha pêwîst e li ser dawîkirina dagirkeriya Tirk seranserî Sûriyê, Efrîn û hemû deverên dagirkirî hem jî derxistina çetên wê kar bikin. Ev yek jî ji bo ku gelê kurd vegerin cih û warê xwe da ku ew bi şêneyên ku li Efrînê û li deverên din ên dagirkirî mabûn, rêveberiyeke xwe ava bikin hetanî ku rewşa Sûriyê bi temamî zela bibe. Li aliyekî din jî pêwîst e mal û milkên koçberan vegere destê wan, divê şêneyên her bajarekî xwe bi rê ve bibin. Di heman demê de kesên sûcdar werin cezakirin û civaka navnetewî bi erkê xwe yê mirovî li hemberî koçberan rabe.

‘Bendava me jiyana me ye’

Birûc Resûl\Qamişlo

Rêveberê Meclisa Bajarê Til Temir Îdrîs Yûsif diyar kir ku ew tu carî dest ji Bendava xwe berdandin û wih got: “Em dest ji bostek ji axa xwe bernadin, ji bo parastina axê çi ji me were xwestin em ê bikin.”

Gelê Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi rojane diçin Bendava Tişrînê û li wir bi hev re noberê digirin, di heman demê de gel bi tevhî îsrara xwe dixwzin ku Bendava xwe biparêzin û jiyanek bi ewle jiyan bikin. di vê demê de gelê Kantona Cizîrê li bandavê ne û li wir bi moralek xurt dimînin. Têkildarî berxwednaiya gel û armanca gel ji nobeta Bendavê Rêveberê Meclisa Bajarê Til Temir Îdrîs Yûsif ji Rojnameya me re wiha axifî.

Îdrîs Yûsif da zanîn ku ew di nav kerwanên gel de derbasî Bendava Tişrînê bû û tevlî nobeta gel a li Bendavê bû û wiha pêde çû: “Em jî wek gelê bajarê Til Temirê ji bo parastina Bendava xwe em bi kerwanên gel re hatin Bendavê. Dema em hatin me nobet ji xelkê Kobanan berxwedêr girt. Dema em tên ser Bendavê ji bo parastina xak û bendava xwe erkek me ya herî sereke ye û pêwîste her welatiyek di Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bijî bendava xwe biparêze. Ev bendav çavkaniya av û elekitrîka me ye û eger dewleta Tirk a dagirker derbasî xaka me bibe dê em ê bê av, elekitrîk û zevî bimînin. Ji ber vê yekê em rojane li ser Bendavê ne û parastina Bendava xwe ji êrîşên dewleta Tirk a dagirker dikin. Di heman demê de em berxwedaniya QSD û YPJ ji dil silav dikin û berxwedaniya wan ya dîrokî silav dikin. Em îro li ser vê xakê bi saya Rêber Apo û QSD xwe jiyan dikin, em bi QSD xwe re xwe re jiyan dikin heya dawî. Her wiha dema em xwe li vir bi cih dikin û pasastina axa xwe dikin cihê kêfxweşiyê ye. Dewleta Tirk jî ji bo ku em bitirsin û ji Bendava xwe dûr bikevin bi balafirên xwe yên bê mirov êrîşî me dike, her roj sivîlan dike hedef û wan qetil dike û birîndar dike. Lê ev tişt îradeya me naşikînin û me ji bendava me dûr naxîne û jer bo bendava me jiyana me ye. Çi ji me were xwestin em ê ji bo parastina xaka xwe bikin û eger were xwestin em canê xwe fedayî welat bikin em ê canê xwe bikin qurban û jiyanek bê welat em jiyan nekin.”

‘Ev 14`e sal e ku em xwe di parêzin’

Îdrîs da xuyakirin ku dewleta Tirk a dagirker dixwaze talaniyek bi serê me bîne û me ji xaka me koç bike û axaftina xwe wiha qedand: “Dewleta Tirk a dagirker dixwaze xaka me ji xwe re bibe û me bê xak bihêle, ma me jî bi hezaran şehîd li ber vî welatî dane em ê çawa bihêlin ku xwîna şehîdên me bimîne ji dijmin re. Dewleta Tirk dixwaze xwe li ser her çar parçeyên Kurdistanê ferz bike û çand, ziman û kevneşopiyên xwe li ser tevahî gelê Sûriyeyê dikim ku bi kerwanên gel re tevlî nobeta Bendava Tişrînê bibin û bi yek îradeyê dijmin têk bibe.”

‘Berxwedana Bendava Tişrînê bû nimûne ji bo giştî gelên Sûriyê’

Hevserokê PYD`ê Xerîb Hiso destnîşan kir ku berwxedana hevbeş ya gelên herêmê, hêzên QSD, YPG û YPJ’ê hişt ku hêza dewleta Tirk lawaz bibe. Herwiha Hiso da zanîn ku berwxedana bendava Tirşînê bandorke mezin di nava civaka Sûriyê û raya giştî ya cîhanî de da avakirin.

Lîloz Hisên/Qamişlo

Ev du meh in êrişên dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê li ser bendava Tişrîn û pira Qereqozaqê berdewam dikin. Ev êriş li ser Sûriyê û tevahiya herêmê xeteriyeke mezin dide avakirin. Lê dagirkeriya Tirk û çeteyên xwe tevî êrişên bi balafirên şer û bikaranînan tevahî çekên pêşketî jî, li hemberî berxwedana QSD û gelên herêmê bêçare maye û nikare gavekê bi pêş ve biavêje. Derbarê berxwedana ku li bendava Şehîdan(Tişrînê) tê kirin û bandora vê berxwedanê, hevserokê Partiya Yelîtiya Demokratîk PYD`ê Xerîb Hiso ji rojnamey me re nirxandin kir. Xerîb Hiso wiha dest bi axaftina xwe kir: “Di rojên destpêkê de dewleta Tirk a dagirker bi zêdekirina êrişan hêvî ji xwe re çêkir, lê bi berxwedan û hevgirtina gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê, piştgiriya wan ji bo hêzên QSD, YPG û YPJ hişt ku hêza Tirkiyê lawaz bibe. Destanên li bendava şehîdan(Tişrînê) têne kirin hatin saz kirin, bû weke mûcîzekî cîhanî pir mezin. Berxwedana ku hate meşandin pêş de çû ji ber ku civakên rêxistinkirî gavan navêjin paş, bi piştgiriya pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê berxwedan bi ser ket û deng veda li pêşbirî cîhanê û gelê Sûriyê bi taybet. Berxwedan û şoreşeke ku biserbikeve hilbet wê bandorê li derdorê çêbike, ev berxwedan bandoreke sereke di hundirê Tirkiyê de ava kir hem di nava gel, siyasetmedar, rewşenbîr û çapemeniya Tirkiyê bû cihê nirxandinê, gelek alî jî ev berxwedan mafdar dîtin û AKP sûcdar dîtin, ji ber ku rewşa Rojhilata Navîn piştî rûxandina rêjîma Esed hate guherandin, lê Tirkiyê di vê rewşê de xwe neda guherandin weke hikumeta AKP, lewma jî êrişên xwe zêde dike li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Dewleta Tirk a dagirker her çiqasî êriş û komkujiyên mezin jî dike lê sivîl bi birayar û îradeyeke mezin berê xwe didin bendavê ji bo parastina vê berxwedan û nirxê giranbuha bike, felsefeyeke nû derket pêş ku gel û şervan bi hev re di çarçoveya şerê gelê şoreşgerî li dijî dagirkeriya Tirk disekinin. Civaka bi rêxistinkirî wê karibe serkeftinê bidest bixe, ev rêxistin û berxwedan hişt ku diha zêdetir piştgirî dervî Sûriyê û Kurdistanê zêde bibe. Metirsiya Tirkiyê ji vê berxwedanê

çêbû lewma banga çareseriyeke aştiyane kir, lê heta niha asta cidiyeta Tirkiyê di çareseriyê de ne diyar e.”

‘Di berwxedan Tirşînê de pîvanên mirovên rêxistinkirî derket pêş’

Hevserokê PYD`ê Xerîb Hiso wiha pê de çû: “Berwxedana gel ya dîrokî hişt ku di hundirê Tirkiyê de guhertin bê çêkirin, Tirkiyê ket nava du hilbijartinan ka êrişan berdewam û giran bike, lê bi domandina şer projeya wan dikeve xeteriyê xewin û xeyalên wan têk diçin û naghêjin armancên xwe, an jî lêvegereke ji xwe re çêbike di aliyê demokratîk û bratiya rast, di heman demê de hemû mijar benda axaftina Rêber Abdullah Ocalan ji bo çareseiyê. Pîvanên di hundirê Rojhilata Navîn de, Sûriyê û Tirkiyê hevsengiyek derxist pêş, ne hevsengiya şer mezitir kirine, lê AKP biryaran bi serê xwe dide ev jî şaştiyeke mezin e, berdewamkirina şêwazê şer, komkujî û afrandina fitneyan û bi tena xwe bimîne wê bibe pirsgirêk ji bo dewleta Tirk çêbike. Dewleta Tirk niha hemû hewildanên xwe dike da ku bi awayekî serkeftî destkeftiyan ji xwe re pêk bîne, cihê xwe bigre di pêvajoya çareseriyê ku di demên pêş de li Sûriyê çêbibe. Herwiha ji bo ku gelê kurd neghêjin armancên xwe û rê li ber demoqrasiya Sûriyê û mafê gelan bigre xebatan dike, li Şamê bazaran dike ji bo domandina êrişan li ser herêma Bakur û Rohilatê Sûriyê, vê yekê jî li ser civaka navdewletî ferz dike, her tiştî bi zanebûn dike da ku roleke çarseriyê bilîze di riya zêdebûn û girankirina êrişan. Çeteyên ku ji bo Tikriyê şer dikirin roj bi roj dev ji çekên xwe berdidin û vedgerin malên xwe, nikarîbûn bibin hêz û bersiv ji bo dewleta Tirk. Gelê herêmê jî bi berxwedan û têkoşînê êriş vala derxistin, kesên ku diçin bendavê da ku bibin hêz ji zarok û hêzên xwe re, ji bo aştî, azadî û parastina xaka xwe diçin, di vir de pîvanên mirovên rêxistinkirî derdikeve pêş.”

‘Berxwedana bendava Tişrînê bû nimûne ji bo giştî gelê Sûriyê’

Hevserokê PYD`ê Xerîb Hiso di nirxandina xwe de wiha anî ziman: “Berxwedana gel, hêzên QSD, YPG û YPJ danîna bedel, şehîd û bi sedan ji birîndaran li bendava Tişrînê hişt ku gelê Sûriyê yên di herêmên din de matmayî bimînin, ku çawa dewleteke weke Tirkiyê bi hemû hêza xwe li gel çeteyan nikarîbûn hêza gel û şervanan bişkînin. Dema ku gelên Sûriyê ev berxwedanî û rêxistinbûyîna gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dîtin bang kirin da ku QSD wan biparêze û di herêmên wan de sîstema xweseriya demokrat ava bibe. Ev zêdetirî deh salan gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê xwe birêxistin kiriye, xwedî proje, saziyên demoratîk, yekrêziya axa welat, çandên herêmê û hêzeke rêxistinkirî ne, rêxistineke xurt di nava jin, ciwanan û hemû beşên civakê de hate ava kirin, ev proje dibe nimûne û tecrûbeyek derdikeve pêş. Pîvanên Şerê Gelê Şoreşgerî tê bikaranîn û tenê pênasekirina van pîvanan di herêma Bakur û Rohilatê Sûriyê de heye, lewma jî gelê hundirê Sûriyê bangewaziya wan zêdetir dibe, ji ber ku ew gelin ne birêxistinkirî ne, civak bê rêxistin û rêvebir maye. Rêjîma Bees nehiştibû gel xwe bi rêxistin bike û nûnerên xwe diyar bike, her dem siyaseteke zordar li ser wan hatibû ferz kirin, di heman demê de çete û dagirkerî vê yekê temam kirine, ji ber vê yekê berxwedana bendava Tişrînê bandoreke mezin li gelê Sûriyê kiriye.”

‘Berxwedana bendava Tişrînê mûcîzeya sedsala nû ye’

Xerîb Hiso îşaret bi berxwedana QSD, YPJ, YPG û gelê herêmê kir û wiha got: “Tabloyeke nû dide nîşandin herwiha bûye mûcîzeya sedsala nû, çûyîna gelê herêmê li qada şer û helwesta xwe diyar bikin cara yekemîne di dîrokê de çêdibe. Di aliyê siyasî, civakî hem hundir û derve bandorek pir mezin da çêkirin, hişt ku wijdan û exlaqê mirov xwe pîvan bike. Li seranserî welatên Ewropa kurd û dostên kurdan destekek mezin didin di riya li dar xistina meş û mêtîngên mezin, li seranserî Kurdistanê gelê bakur rojane têne ser sînorê rojavayê Kurdistanê çalakiyên piştgiriyê pêk tînin tevî zextên dewleta Tirk a dagirker, di heman demê de li başûr û rojhilatê Kurdistanê, ev ruhê bandora vê berxwedanê nîşan dide.”

‘Bendava Tirşînê destkeftiyeke mezin e ji bo gelên herêmê’

Xerîb Hiso wiha domand: “Raya giştî ya cîhanê rewşa li herêmê dişopîne û berxwedana bendavê mafdar dibîne, gelek alî, saziyên civaka sivîl û gelek hewildanên berfireh ji bo sekinandina êrişan dixebitin, zexteke mezin li ser dewleta Tirk û AKP tê kirin, ji ber ku di van êrişan de gelek komkujî, kesên navdar û mirovên xwedî bandor kir hedef. Bendava Tişrînê destkeftiyeke mezin ji bo gelê herêmê ye, di vê çarçoveyê de bi sedema êrişan bendav li ber rûxandin û tehlûyekê ve diçe, rûxandina wê metirsiyeke pir mezin li ser mirovan û zindiyên din dike. Gerek civaka navdewletî li gorî qanûn û pîvanên navdewletî van binpêkirina qebûl neke ev cihê şermezariyê ye, divê saziyên cîhanî yên têkildarî bendavan û saziyên ekolojîk bêdeng nemînin, tenê li gorî berjewendiyên welatên xwe tev negerin.”

‘Tirkiyê xwe kiriye navenda teror û çeteyan’

Xerîb Hiso bal kiand ser dadgeha

Broksilê; Ji bo eşkerekirina sûcên dewleta Tirk a dagirker li dijî mirovan, bi dîmen û delîl dadgehek hate li dar xistin. Dewleta Tirk a dagirker xwe kiriye navenda teror û çeteyan, bi hev re sûcên dijî çanda exlaq û hiqûqê dikin, di hundirê Sûriyê de sûcên pir hovane der heqê gel kirin û li hemberî îradeya gel sekinîn. Li Efrîna dagirkirî bi hezaran darên zeytûnan hatin birîn û cihên kevneşopî hetin dizîn, gorên êzîdiyan hatin rûxandin û hatin belge kirin, di heman demê de li Serê Kaniyê, Girê Spî û her deverên kurd lê jiyan dikin. Dadgeha Broksilê bandoreke mezin di nava raya giştî de çêkir. Em bi hêvî ne di demên pêş de mîna van dadgehan bên li dar xistin, hewildan heye ku li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê dadgeheke ji bo mîrên DAIŞ`ê bê li dar xistin û bang li welatên derve bê kirina da ku di darizandina wan de hazir bibin, lê zehmetiyên vê pilanê hene. Bi van wesîleyan ancex hesab ji dewleta Tirk û çeteyên girêdayî wê bê xwestin bi nîşan û delîlan li pêşiya raya giştî û ji bêdengiya xwe derkeve.”

‘Divê civaka navdewletî bi erkên xwe rabe’

Hevserokê PYD`ê Xerîb Hiso bangewazî li civaka navneteweyî kir ku bi erkê xwe rabe û axaftina xwe wiha qedand: “Di aliyê siyasî û dîblomasî de hewildan pir têne kirin, hem di hundir û derve da ku ev şer were sekinandin. Ji ber ku yê dixwaze di Sûriyê de aştî, aramî û çareseriyeke demokratîk pêk were, gerek banga sekinandina şer û êrişan bike, yeksere zext li dagirkeriya Tirk û AKP bê kirin, eger liv û tevger ji bo çareseriya Sûriyê neyê kirin wê zêdetir pirsgirêk bêne kur kirin û şerê navxweyî wê zêde bibe. Bangewazî ew ku civaka navdewletî li gorî pîvan û qanûnên weke mîsaqên navdewletî bi erk, misyon û berpirsyartiya xwe rabin û van êrişên ku têne kirin, bidin rawestandin.”

Rîhan Loqo: Armanca dewleta Tirk dagirkirina tevahî Rojhilata Navîn e

Koordînasyona Kongra Star Rîhan Loqo diyar kir ku armanca dewleta Tirk a dagirker ne tenê dagirkirina Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye, lê ew dixwaze ku Rojhilata Navîn bi tevahî dagir bike û wiha got: “Pêwîst e dewleta Tirk a dagirker li ser asta navneteweyî bê cezakirin.”

Dîlan Mulhim\Qamişlo

Di derbarê êrişên dewleta Tirk a dagirker li ser Bakur û Rojhilatê Sûryê, koordînasyona Kongra Star Rîhan Loqo bersiva pirsê Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

-Dagirkeriya Tirk behsa çareseriyê dike û ji alîkî ve siyaseta xwe ya qetilkirinê berdewam dike, hûn vê yekê çawa dinrxînin?

Dewleta Tirk a dagirker êrişên xwe ne tenê li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê dide meşandin, lê belê li ser tevahiya Rojhilata Navîn dide meşandin. Dagirkeriya Tirk a faşîst zagonên navdewletî binpê dike û rojane bi belafirên xwe yên bêmirov êrisî gelê kurd dike û sivîl, jin û zarokan dike hedef. Herwiha dagirkerî şerê taybet jî li ser gelê me dide meşandin û armanca şerê taybet ew e ku moralê gel bişkîne. Armanca van êrişan dagirkirina tevahiya Rojhilata Navîn û tunekirina gelê azadîxwaz e. Dewleta Tirk dixwaze ku çand û nasnameya gelê kurd di nava Kurdistanê de tune bike. Li hemberî vê siyaseta dewleta Tirk a qirêj têkoşîna gelê kurd bi hezarê salan li hemberî hişmendiya nijandperstî û dagirkeriyê berdewame. Di heman demê de gelê kurd ji bo azadiya mafê xwe di nava têkoşînê de ne û bi şev û roj li qadan e. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ev 13’sal in li hemberî siyaseta dewleta Tirk a

dagirker berxwedaniyeke bêhempa ji aliyê gelê kurd û bi taybet jinan ve tê kirin. Em dibînin her ku dewleta Tirk ber bi tunebûnê ve diçe bangewazî û doza çareseriyê dike û dibêje em amedene ji çareseriyê re. Li kêleka wê jî êrişên xwe berdewam dike û rojane komkujiyan li ser gelê kurd pêk tîne. Ew siyaseta xwe ya qirêj li dijî gelê kurd pêk tîne.

-Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê êrişên dewleta Tirk berdewamin, li hemberî van êrişan pêwîste çi were kirin?

Dewleta Tirk a dagirker bi hemû hêz û teknîka xwe êrişî gelê kurd dike û bi sedema vê siyaseta xwe a qirêj a ku li ser gelê kurd dide meşandin ew di nava aloziyan de derbas dibe. Herwiha dewleta Tirk a dagirker dixweaze pilanên qirker li ser gelan bimeşîne û bi taybet gelê kurd. Ji ber vê yekê her ku van êrişan dike, têkoşîna gelê kurd xurtir dibe. Di heman demê de dewleta Tirk bi qetilkirina gelan navdar e û ne tênê êrişî gelê kurd dike lê belê çi gelê ku doza azadiyê dike êrişî wan dike. Li hemberî vê hişmediya dewleta Tirk a qirker têkoşîneke xurt tê kirin.Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê êrişên dewleta Tirk û çeteyê girêdayî wê berdewamin û rojane bi belafirê xwe yê bîmirov êrişî herêmê dike. Herwiha piştî hilweşandina Rêjîma Baas gelek guhertin û veguhertin li herêmê çêbûn, dewleta Tirk ji van guhertinên li herêmê sûd girt û êrişên xwe zêdetir kirin. Dagirkeriya Tirk dixwaze herêma Rêveberiya Xweser jî dagirbike û siyaseta xwe ya qirêj bide meşandin. Li hemberî wê jî pêwîste gelên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bibin desteke û li hemberî siyaseta dewleta Tirk a dagirker têkoşîn û berxwedaniyê bikin. Herwiha nehêlin ku pilanên dewleta Tirk a faşîst bi serbikeve.

-Ji bo çareserkirina pirsgirêka gelê kurd û tevahî pirsgirkên Rojhilata Navîn hêza Rêber Apo heye, li sr wê bingehê gelek hevdîtin bi Rêber Apo re hatin kirin, niha jî çavî tevahî ccçhanê li peyamam Rêber Apo ya dîrokî ye, hûn vê pêvajoyê çawa dinrxînin?

Ev çend salin ku gelê kurd dixwazin ku bi Rêber Apo re hevdîtin çêbibin. Lê dewleta Tirk a dagirker cezayan li ser Rêber Apo ferzdike û nahêle ku hevdîtin pê re pêk werin. Azadiya Rêber Apo azadiya gelê kurd e û gel li hêviya peyama Rêber Apo ne ku wê di vê mehê were belavkirin. Wê peyam ji bo pirsgirêka doza kurdî û tevahiya pirsgirêkên herêmê be. Armanca Rêber Apo çaresrkirina pirsgirêka kurd û pirsgirkên Rojhilata Navîn e. Piştî têkoşîna gelan ji bo azadiya Rêber Apo a fîzîkî û israrkirina gelê kurd di dozê de hebû ,herwiha berxwedaniya ku niha li herêmê tê meşandin ji aliyê gel û şervan ve, vê yekê hişt ku dewleta Tirk a dagirker behsa çareseriyê bike. Lê ew di heman dfemê de êrişên dewam dike. Dagirkeriya Tirk xetimandike cidî jiyan dike.

-Daxwazên we çi ne?

Daxwaze me ew e ku bi azad jiyan bikin, êriş bên rawestandin û herêmên dagirkirî bên rizgar kirin. Herwiha dewleta Tirk bê cezakirin li ser sûcên xwe. Em weke jin hêviyên me yên azadiyê xurtin. Heta dilopa xwînê di cane me de hebe em ê têkoşîn û berxwedaniyê berdewam bikin. Dewleta Tirk bi van êrişên xwe nikare îradeya me bişkîne û heta nefsa dawiyê em ê têkoşînê bikin. Ji bo berdewambûna vê têkoşîna dîrokî ya ji bo jiyaneke azad, wekehev, pêwîste ku pirojayeke jinan di her welatekî de were avakirin, ji bo ku jin bi nasname, hebûn, çand û xweseriya xwe jiyan bike. Em weke jin dibêjin çareseriya hemû pirsgirêkan û di serî de pirsgirêka jin azadiya fîzîkî ya Rêber Apo ye, bi azadiya Rêber Apo wê azadiya hemû pêkhateya misoger bibe.

Tirkiyê, Sûriyê dixe nava şerekî nû yê navxweyî

Zekî Bedran

Dewleta Tirk ji bona avakirina Sûriyekê nû, rola herî qels û bêbandor dileyîz e. Tirs û xofa statûgirtina gelê Kurd wana dorpeç kiriye. Ji ber vê yekê ew israr dike ku Sûriya nû jî, weke demê deshilatdariya rejîma Baas`ê bibe pergalekî dewlet-netew ya hişk û navendîparêz. Ew rê nade ku gelê Sûriyê li ser bingeha pêwîstiyên xwe û lihevhatineke navxweyî tevbigerin di guftûgoyekê demokratîk û pêkhatinê de pêk bîn e. Tirkiye tê payinkirin, destwerdana karûbarên navxweyî yên Sûriyê dike û li ser HTŞ`ê zext dide avakirin û wan neçar dihêle.

Rêvebiriya Erdogan bi hemû hêza xwe ya hundir û derve hewl dide ku Kurdan di nava avakirina Sûriyeke nû de cih negirin û pergala Rêveberiya Xweser têk bibe û vê yekê pir zelal dike. Bi gotina xwe qaşo “YPG hêzeke ku li ser ewlehiya Sûriyê gef dide avakirin” û li ser hemû hêzên di nav Sûriyê de cih digirin dixwaze ferz bike. Ji bo YPG`ê cîhan seferber kirine û nahêle HTŞ bi QSD`ê re li hev bike, pirsgirêkên xwe bi danûstandinên erênî çareser bike. Bi salan e ku DYA'yê re li ser vê yekê niqaş û goftûgoyan dimeşîne. Ji wan hêzan re dibêjin “Girtiyên DAIŞ`ê veguhezînin HTŞ`ê û me” û her wiha dubare dikin “Êdî hewcedariya we bi QSD`ê nemaye, çi xizmetê hewce bike em ê bikin.” Di heman demê de jî, ji bo reşkirina QSD`ê û di navbera pêkhateyên ku di herêmê de jiyan dikin de nakokiyan ava bikin, ci derfet di destê wan de hebe, bikar tîne.

Li cihanê de tu kesî YPG weke rêxistîna terorê ne pejirandî ye. YPG`ê jî şaxekê leşkerî ya girêdayi QSD`ê ye û di kêleka hêzên hevpeymana navneteweî li dijî DAIŞ`ê de şer kiriye. Ji bilî rizgarkirina cîhanê, qedandina aloziyan zêdetir tiştek nekiriye û bi ti hêzên cuda ve neketiye di nava şer û pevçûnan. QSD`ê xebatên xwe yên bi koalîsyonê re jî didomîne. Ti hêzan li dijî dewleta Tirk şer ne ragihand. Dewleta Tirk weke belayekê daketiye ser Sûriyê û êrîşî Kurdan û QSD`ê dike. Ti kesî'an sînor derbas nekiriye û gund jî dagir nekiri ne. Dewleta Tirk ku ketiye Sûriyê û gelek herêm dagir kiriye û dixwaze dagirkeriyê berfireh bike.

Hemû cîhan dibêje ku divê şer û pevçûnên li Sûriyê bi dawî bibin. Rejîma Baasê nema, rêveberiyeke nû ava dibe. Lê dewleta Tirk şer nade sekinandin, hewl dide li qadên mezintir belav bike. Li Tişrîn û Qereqozaqê çi dikin, çima bi mehan êrîş dikin? Niha jî Tirkiye dixwaze ji HTŞ`ê êrîşê herêmên Rêveberiya Xweser bike. Ew bi mehan e bi SMO ya ku xwe girêdayî li wan e êrîş dike. Lê belê bi van hêzan nekarî ti encamê bigire. Bi êrîşên esmanî ziyanek mezin gihandin bendava Tişrînê. Êrîşên xwe berdewam dikin. Niyeta wan a rawestandinê tine ye. Tevî ku DYA ji bo agirbestê û parastina bendavê mudaxele kir jî, danûstandin bê encam man.

Bi hevdîtinên di navbera HTŞ, QSD û Rêveberiya Xweser de ji bo çareserkirina pirsgirêkan ti pêşketin çênebû. Di civîna destpêkê de, ya li Şamê hat lidarxistin li ser mijarên bingehîn lihevkirinek hatibû kirin. Lê dewleta Tirk mudaxeleyî pêvajoyê kir. HTŞ`ê nikare ti gavan bavêje. Pêwîste gelê Sûriyê û cihan bizane ku ya ku rê li ber van hevdîtinan digire û çareseriyê asteng dike rêveberiya Tirkiyê ye. HTŞ`ê nikare li hemberî dewleta Tirk bihêz bisekine. Dewleta Tirk ji ber ku alîkarî dane wan dixwaze wan bixe bin serweriya xwe. Ne hewceye ku HTŞ bi QSD`ê re şer bike. Ev bi kêrî kesî nayê. Her wiha tişta ku Sûriyê pêdiviya wê bi wêrankirin û mirinên nû nîne. Berovajî vê yekê pêwîste hemû hêz û derfet bê bikaranîn ku ji bona Sûriyê rabe ser lingan.

QSD û Rêveberiya Xweser dixwazin pirsgirêkên xwe di çarçoveya yekitiya Sûriyê de çareser bikin. Lê belê dixwazin ev Sûriye bibe welatekî demokratîk. Ji bilî vê jî ti daxwaz û ferzkirinên wan nînin. Kes naxwaze dewleteke cuda ava bike, kes naxwaze QSD`ê weke artêşeke cuda bimîne. Di heman demê de lihevkirinek heye ku çavkaniyên binerd û sererd yên hemû Sûriyeyê ne. Bi kurtasî ti pirsgirêkek ku neyê çareserkirin di holê de nîne. Li gel vê jî tu pirsgirêk nayê çareserkirin. Sedema vê jî ew e ku dewleta Tirk rasterast destwerdana peywendî û danûstandinan dike. Naxwaze HTŞ'ê bi vîna xwe bi QSD û hêzên din re pirsgirêkan çareser bike. Xwaştek û daxwaza Tirkiyeyê ew e ku HTŞ êrîşî QSD'ê bike.

Hêzên opozîsyona demokratîk li Sûriyê weke tê xwestin nehatiye rêxistinkirin. Bi rastî, hêzekî pir xurt heye. Nêzikî çarêka welêt jixwe xwedî rêveberiyekî demokratîk e. Rêveberiya Xweser ezmûneke xurt bi destê xistiye. Modêleke berbiçav, xuya heye. Dûrzî, Elewî, tevgerên jinan û beşeke mezin a rewşenbîr û laîk hene. Eger ev hêz xwe birêxistin bikin û hevkariyê bikin, Sûriye dikare pêşketineke mezin ava bikin. HTŞ`ê ji demokrasiyê hez nake, lê bi tena serê xwe jî nikarin bibin xwediyê hemû Sûriyê û vîna gelan radestî bigirin. Gelek hêzên derve ne li gel wê ne ku HTŞ'ê bi serê xwe hikûmetekî tûndrew ava bike. Di derbarê HTŞ'ê de jî, gelek guman hene. Ji ber wê hê jî li lîsteya rêxistînên terorê derneketiye. Tirkiye li ser van ferz dike ku bi lez û bez desthilatdariyekî otorîter ava bikin. Lê cihana Ereb, Israîl û rojavayî naxwazin Sûriyê ji Tirkiyê re bihêlin.

Niha xuyaye hêzên rojavayî, Iraq û Sûriyê jî di nav de, karê têkbirin û qirkirina kurdan di bin destê Tirkiyê de hiştiye. Ji ber ku kes nabêje artêşa xwe ji Sûriye û Iraqê vekişînin. Li hemberî êrişên wan tu bersivek bi bandor nayê dayîn. Ji ber wê yekê rêveberiya Tirkiyê li gorî xwe hespê xwe dide bezandin û dixwaze li Sûriyê roleke wêranker dilîze.

15’ê Sibatê 2025

Farûk Sakik

Piştî Şerê Yekem ê Cîhanê li Almanya qeyranek mezin çêbû. Peymana Versailles a sala 1919’an şertên giran dabû pêş Almanya.

Di demek wiha de, gelên Almanya kesek wek Hitler ji xwe re wek lîderê xilasiyê dîtin û ew anîn kirin desthilatdar. Piştre em tev bûn şahid ku çi felaketeke mezin anî serê mirovahiyê. Li Tirkiyê jî îroj ew rewşa Almanya ya wê demê heye. Erdogan dewsa Hitler de li Tirkiyê wek kesek wê vê civakê xilas bike, di sala 2002’an de hat desthilatê. Lê îroj wek Hitler tevdigere.

Di destpêkê de bi arguman û pratîka xwe hêvî dida civakê. Roj hat (2025) li Tirkiyê qeyrana aborî, siyasî, civakî kurtir bû. Wek dîktatorek tevdigere. Parlemento êdî wek hêzêk demokrasiyê nîne.

Di dema Osmaniyan de Padîşah bi ‘fermaname’ yan destîhilata xwe didomandin. Erdogan jî bi ‘karnameyên di dewsa qanûna de’ çi bixwaze dike. Hiqûq hatîye binpêkirin. Li gorî îstatistîkan li cihanê hiqûqa Tirkiyê di navbera 142 welatan de di rêza 117’an de cih digire.

Pêvajoya aştiyê ku ev 3 meh e di rojeva Tirkiyê de ye, hêviyên mezin da civakê. Hin hêzên dewleta Tirk paşeroja Tirkiyê dîtin ku ber bi xirabiyekê ve diçe, riya çareseriyê Rêber Apo dîtin. Hevdîtinan destpê kir. Di 15’ê Sibatê de wê Rêber Apo bi vîdeo-bi deng wê starta vê pêvajoyê bida destpêkirin. Ev vîdeo amade bû. Lê Erdogan destûr neda vê yekê. Erdogan naxwaze li Tirkiyê demokrasî pêk were. Ew jî şer û kaosê sûd werdigire. Bi vî terzê xwe bi salan li destîhilatê maye. Heger rojek aştî û demokrasî were vê xakê, tu argumanek ku wî li destîhilatê bigire namîne. Ji bo vê yekê di şerê li dijî Kurdan de israr dike. Li hemberî van hêzên ev pêvajo dane destpêkirin û bide seknandin jî tune. Ev hêz Bahçeliye, ev hêz di hilbijartinên mijdara 2015’an de MHP anî kêleka wî ne. Ev hêz, hêza di sala 2015’an de şer jî dabûn destpêkirin bû. Lê dîtin bi salan e di şer de nikarin têkoşîna Kurdan bidin seknandin. Bîadkirin.

Îtîraf kirin. Erdogan bi van kiryarên xwe li aliyekê jî dixwaze Kurdan provoke bike. Dixwaze Kurdan li dijî Rêber Apo sor bike. Her wek bibêje, bi Rêber Apo re, li ser maf û hiqûqa Kurdan tu lihevkirinek tune. Bi kiryarên xwe dixwaze ji civaka Tirkiyê re bibêje di navbera dewletê û Abdullah Ocalan de tu lihevkirinek tune. Bi tenê ‘dawîanîna terorê’ di hedefa me de ye. Erdogan, li dijî pêvajoyê helweştek çawa dimeşîne? Xwe li mirîtiyê dide. Her wek tiştek tunebe tevdigere. Destûr neda ku dakuyaniya Rêber Apo di 15’ê Sibatê de were xwendin. Dema ku em li dîroka Tirkiyê dinêrin gelek caran li ser sembol û dîrokan peyam didin civakê. Erdogan jî îro vê çendê ve kevneşopiya li dijî Kurdan bi rê ve dibe.

15’ê Sibatê roja reş bû ji bo Kurdan bi dengê Rêber Apo wê vê rojê biguhertina roja azadiyê. Herkes li benda dengê Rêber Apo bûn. 26 sal bû dengê wî nebihîstibûn. Ew roj bi taybet li Ewrûpa Kurd li benda dengê Rêber Apo bûn. Erdogan di 15’ê Sibatê de Kurdan û dostên Kurdan jî vî dengî merhûm hişt. Ew roj bi politikaya qeyûman şaredariya Wanê dagir kir. Li rojavayê Kurdistanê ji bo statuyek Kurdan saz nebe, di qada navneteweyî de destê bi xebatên diplomasiyê kiriye. Hakan Fîdan bê sekn rojê li deverek bi dakuyaniyek cuda dixwaze di dîzaynkirina Sûriya nû de kurd cih negirin.